Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de

Agirî

Duheftînameyek Siyasî-Gistî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (251) 04-04-2015 Buha (150) Tûmen

Şehîdên Kurdistanê di dilê me de dijîn



Rêûresma 10'ê Xakelêwe li binkeya Deftera Siyasî a PDKÎ bi rê ve çû.

Sibêdeya roja 10' Xakelêwe a sala 1394a'n, rêûresma taybet bi roja şehîdên Kurdistanê, li binkeya Deftera Siyasî a PDKÎ bi beşdariya birêz Mistefa Hicrî sekreterê giştî û endamên rêberî, kadr û pêşmerge û mêhvan û malbatên rêzdar ên şehîdan bi rê ve çû.

Di beşa yekem a rêûresmê de, piştî rêjeya leşkirî a hêza pêşmergê Kurdistanê ber bi goristana şehîdan, û herweha pêşkêşkirina du sirûdên "Ey Şehîdan" û "Merêjin bom firmêskî xem", tace gula wefadarî û rêzgirtinê ji aliyê birêz Mistefa Hicrî sekreterê gişî û birêz Se'îd Meqrûzî ve, li ser gora şehîdan hate danîn. Di beşa duyemîn a rêûresmê de pêşangeha wêneyên şehîdan ji aliyê birêz Hesen Şerefî û yek ji malbatên şehîdan ve, bi rûyê beşdaran hate vekirin.

Di beşa sêyemîn a rêûresmê de ku di salona rêûresmên PDKÎ de bi rê ve çû, piştî sirûda netewî ya "Ey Reqîb" û ragirtina xulekê bêdengî bona rêzgirtin ji canê paqij ên şehîdên Kurd û Kurdistanê, peyama birêz Mesûd Tek sekreterê Partiya Sosyalîst a Kurdistanê bi vê boneyê ve hate pêşkêşkirin. **Dom R:2**

Roja şehîdên Kurdistanê li Nawenda 3'ê a Kurdistanê bilind hate nirxandin



Roja Sêşemî berwara 11'ê Xakelêwa sala 1394'an, rêûresma 10'ê Xakelêwe roja şehîdên Kurdistanê li Nawenda 3 a Kurdistanê, bi beşdariya endamên rêberî, kadr, pêşmerge û mêhvanan hate lidarxistin. Di despêka beşa yekem a rêûresmê de, piştî sirûda netewî ya "Ey Reqîb" û deqeyek bêdengî bona rêzgirtin ji canê paqij ê şehîdên Kurdistanê, peyama nawenda 3'ê a Kurdistanê ji aliyê birêz **Dom R:2**



Birêz Tahir Mehmûdî Endamê Komîteya Nawendî a PDKÎ:

"Pêşewayê Kurdan, derd û êşa civatên xelkê Kurdistanê destnîşan dike, û kilîda dergehê bexteweriyê dide wan, û..."

Armancên şerê Helebçe (beşa 2 û dawî) 4 R: 3



Netirsiyan ji mirinê remza zindîmanê ye 6



Teymûr Elyasî: "Îranê 5 peymanname ji koma wan peymannameyên navnetewî ku pejirandine...". 5



Saleke nû, û diruşmeke din 7



Amîn Xusrewî: "Hilbijartina rê û rêbaza PDKÎ ku bi baweriya min her doma rêbaza Qazî û Qasimlo û Şerefkendî ye...". 8



21'ê Adarê, roja cîhaniya xebata li dijî ferq û cudahiya regezî yan tepeseriya neteweyî 9



www.arsivakurd.org

Sergotar

Civîna Lozanê



Şehab Xalidî

Komara Îslamiya Îranê ku Amerîka wekî Şeytanê mezin bi nav dikir,û di wan çend salên borî de, radigehand ku em teslîmî daxwaziyên wan nabin û ew dorpêçên aborî jî ku bi ser me de spandine, ji kaxezên diriyayî zêdetir tu riştek nînin, û nikarin bandora xwe li ser me bikin, û digotin xelkê me hêz û şiyana xweragirtinê di hemberî wan dorpêçan de hene, lê piştre cîhanê dît ku çawa Îran di bin barê giran yê dorpêçên aborî de dinale, û rewşa aborî gihaye astekê ku sebr û taba xelkê welat nemaye, û her demekê egera teqîna kerb û kîna vî xelkê bêzarbûyî ji destê siyasetên serhişkane yên rayedarên rejîmê heye, lewra Xamineyî destewajeyek bi navê "nermiya qehremanane" anî berbas, û wisa nîşan da, ku ew teslîm nebûne, belkû ew nermiya wan di hemberî Amerîkayê de, şêweyek ji qehremantiyê ye.

Encama hewldanên rayedarên Komara Îslamî bona derketina ji bin barê giran yê dorpêçên aborî, vexwarina cama jehrê bû li Lozanê de, û wan soz da ku di hemberî rakirina dorpêçan de, biryarên civîna Lozanê cî bi cî bikin, heya wê roja ku lihevkirina dawiyê îmze dikin.

Bêguman hekî ew lihevkirina wan bibe sedema vê ku rewşa aborî ya welat baştir be, û xelk ji destê giranî û bêkariyê rizgar bin, û ji aliyekî din ve, ew bi kiryar sozên xwe bi cih bînin, û hewlê nedin ku bi awayekî veşartî kar bo çêkirina çeka navikî bikin, ew lihevkirin wê baş be.

Lê dîroka zêdetir ji 30 salan deshilatdariya rejîma Îranê selimandiye, ku ew rejîm ne cihê baweriyê ye, û herwekî ku Binyamîn Natanyaho ragehand, ew lihevkirin ne tenê nikare pêşiya destpêregihîştina rejîma Îranê bi çeka navikî bigre, belkû rê ji bo rejîmê xweş dike ku bi awayekî nepenî çeka navikî çêbike.

Lewra bi baweriya me ew lihevkirin metirsiya wê heye, û zêdetir wê di berjewendiya rejîmê de be, ne di berjewendiya xelkê welatê me de.

Sekreterê PSK'ê birêz Mesûd Tek beşdarî merasima roja Şehîdan bû, ku li bajarê Koyê, di baregeha nawendî ya PDKÎ de hatibû amadekirin, û peyama jêr pêşkeşî beşdaran kir:



Kes û kar û malbatên dilşewitî ên şehîdan!

Birêz Kak Mistefa Hicrî, sekreterê giştî yê Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê!

Endamên Komîteya Navendî û Deftera Siyasî ya PDKÎ, yên berketî!

Kadr û peşmergeyên tekoşer!

Bi navê hemû endam û alîgirên Partiya xwe, bi boneya 10'ê Xakelêweyê, ez li ber Pêşewa Qazî û hemû şehîdên Kurdistanê kirnoş dibim, û peymanê nû dikim, ku em nehêlin alaya şehîdan bikeve erdê.

Xwîşk û birayên delal!

Ala û sirûd nirxên hevbeş ên hemû neteweyan in. Nirxên me yên hevbeş jî hene ku, peywendiya me û hest û bîr û baweriya neteweyî bihêztir dikin, ku ew in: Ala Rengîn, Sirûda Ey Reqîb û cejna Newrozê. Ala Rengîn alaya hemû Kurdan e. Kurd her li ku derê bin, bi heman hestê newrozê pîroz dikin, û sirûda Ey Reqîb dixwînin. Her netewe di rojên xweşî û şadiyê de bi hevra şadî, û di rojên xembariyê da pêkve xemgîn dibin.

Hevalên berketî!

Ji bona xebatgerên Kurd şehîd bûn armanc nîne, lê bêle ger pêwîst be, tekoşerên Kurd bê tirs çûne ser mirinê û bûne cangoriyê gel û welat. Her wekî helbestvanê mezin û tekoşer Abdullah Peşêw dibêje, di bin her kevirekê, di bin her darekê û her şîkefteke Kurdistanê da şehîdên me hene. Lê belê pir mixabin, hêşta me rojekê hevbeş ya şehîdan nine, ku hemû Kurd di vê rojê da şehîdên xwe bi bîr bînin, û sond bixwin, ku riya wan berdewam be.

Xwîşk û birayên xoşewîst!

Bêguman hemû rojên sale hêjayî hindê ne, ku ji bona roja şehîdan werin destnîşankirin. Ji ber ku roj nîne, ku ji bona azadiya Kurdistanê çendîn Kurd şehîd nebin. Lê belê li gor bîr û baweriya me roja 10'ê Xakelêwe (30'ê Adar) guncavtirîn roj e, ku wekî roja şehîdan were destnîşankirin. Ji ber ku 10'ê xakelêweyê roja şehîdkirina serkomarê yekemîn ê Kurdistanê Pêşewayê nemir û hevalên wî ye.

Beşdariya Barzaniyan di damezrandin û parastina Komara Kurdistanê, û piştgiriya hemû Kurdan li Komarê, nîşana hindê ye ku Komar ya hemû Kurdan e, serokê wê jî serokê hemû Kurdan bû.

Ji ber vê yekê em piştgiriya biryara sêyemîn Konferansa Ciwanên Herçar Parçeyên Kurdistanê dikin û pêşniyara me ev e, ku 10'ê Xakelêwe bibe roja şehîdan, da ku hemû Kurd di vê rojê da bi hevra şehîdên xwe bi bîr bînin, û peymanê nû bikin, ku bona gihîştina bi armancên wan kar û xebatê bikin.
Ez carekî din li ber Pêşewa Qazî û hemû şehîdan kirnoş dibim.
Riha wan şad, û rêya wan berdewam be.

Doma R:1

Paşan, piştî pêşkêşkirina sirûdek şoreşvanî ji aliyê Kora Muzîk a PDKÎ ve, peyama Komîsyona Komelayetî a PDKÎ ji aliyê birêz Tahir Mehmûdî endamê Komîteya Nawendî ve hate xwendin.
Rêûresmê bi helbesteke taybet bi wê rojê ve ku ji aliyê Çengîz Sîgarçî ve hate pêşkêşkirin karê xwe berdewam kir, û paşan peyama her sê rêkxirawên Lawan, Jinan û Xwendekarên Demokrat ên Kurdistana Îranê, ji aliyê Hêriş Kerîmî endamê heyeta îcrayî ya Yekîtiya Xwendekaran ve hate pêşkêşkirin.

di dawiyê de rêûresmê bi sirûdekê ku ji aliyê Kora Muzîka PDKÎ ve hatibû amadekirin, dawî bi karên xwe anî.

Doma R:1



Kerîm Qelatî berpirsê beşa Komelayetî a Nawenda sê ve hat pêşkêşkirin. piştre pexşana "silav li Dr. Qasimlo" ku ji aliyê Selah Semedî ve hatibû nivîsandin, û ji aliyê Xalid Gergolî ve hate pêşkêşkirin û piştre sirûda "Şehîd" ji aliyê girûpa sirûd a Komîteya "Hîway Lawan" ve hat xwendin, û herweha pexşana "Pêşewa berew Herman" jî ji aliyê Hesen Husênniya ve hate pêşkêşkirin. Di beşa duyemîn a rêûresmê de, beşdaran bona rêzgirtin ji şehîdên Kurdistanê, serdana goristana şehîdên PDKÎ li Cêjnîkanê kirin û piştî xwendina sirûda "Ey Şehîdan" tace gula rêzgirtinê ji aliyê birêz Sidîq Derwîşî endamê Komîteya Nawendî û Xûşka Rihan hevjîna şehîd Kazim Ezîzî ve, li ser gora şehîd Seyîd Rehîm Cîgerî hate danîn.
Di beşa sêyemîn û dwiya rêûresmê de, pêşangeha wêneyên şehîdên Nawenda Sê a Kurdistanê ku ji şehîdên komî teyên Sino, Nexede, Pîranşar, Urmiye, Selmas, Xoy û Makûyê pêk dihatin, ji aliyê birêzan Rehîm Gergolî û Şadî Mînberî, keça şehîd Hejar Mînberî ve hate vekirin, û ji aliyê beşdarên rêûresma 10'ê Xakelêwe ve bi germî hate pêşwazîkirin.

www.agirsivaknd.org

Peyama Komîsyona Civakî ya PDKÎ bi boneya 10’ê Xakelêwe roja şehîdên Kurdistanê



Civatên xelkê Kurdistanê!
Xortên neteweya Kurd!
Malbatên serbilind ên şehîdên Kurdistanê!

Îro roja 10’ê Xakelêwe roja şehîdên Kurdistanê ye. Roja rêzgirtin û emegnasiya di hemberî wan cangoriyan e ku ji bo asûdeyî û bextewerî û jiyana bi azadî ya neteweya xwe û ji bo bergirî ji xak û xelkê Kurdistanê, jiyana xwe ya asayî danîne aliyekî, û fîdakarî gihandin lûtkeya herî bilind ya xwe, û bi bexşîna can û xwîn û jiyana xwe di pêxema hêvî û armancên Kurd de, serê xwe danîn û bûne remza xebat û xweragiriyê, û bi xwîna xwe belgeya neteweyîbûn û rewayiya mafên Kurd mor kirin. Lewra xortên neteweya Kurd jî wekî emegdarî bi armancên xwe di hemberî vê bexşîna mezin de, serê rêz û hurmetê ji bo canê wan yê pak dadinên.

Xebata neteweya Kurd bi berfirehiya xaka Kurdistanê ye, û bihust bi bihustên vê xakê jî cihê hembêzkirina şehîdekî ye, lewra hemû cihên Kurdistanê cihê şehîdan û hemû rojên sal û salan, roja emegdariya di hemberî şehîdan û pêregihîştin û rêzgirtina ji malbatên wan e.

Bi vî halî jî bona vê ku rojek di salê de wekî roja şehîdan bê diyarîkirin, û di vê rojê de em şehîdên xwe bi bîr bînin, emegnasiya xortên Kurd, bi awayekî giştî û bi hev re ji bo şehîdan bê ducarî kirin, roja 10’ê Xakelêwe roja bidarvekirina Pêşewayê Kurd QazîMihemed, avakerê PDKÎ û yekem serkomarê Komara Kurdistanê û hevalên wî, di 10’ê Xakelêweya sala 1326 (Adara sala 1947)’an de, wekî roja şehîdên Kurdistanê hate diyarîkirin.

Lewra îsal jî di vê boneyê de, bi kombûna li dewra yektir û bi awayên cur bi cur em şehîdên xwe bi bîr tînin û silavan dişînin bo riha pak ya hemû şehîdên riya azadiya Kurdistanê, û bi wan re soz û qewlên xwe nû dikin ku emê riya wan ya pîroz bidomînin, û emê bi armancên wan emegdar bimînin, û rêz ji malbatên wan yên rêzdar wekî yadgarên wan şehîdan bigrin. Her di vê boneyê de şîretên Pêşewa Qazî Mihemed ji bo xortên neteweya Kurd di bîr û mêjiyê xwe de bidin berhev, û bergirîkirina Pêşewa di dadgeha fermayişî ya rejîma paşatiyê de wekî belgeyeke dîrokî ya bihêz di warê selmandina rêbaza bi heq ya Kurd û Pêşewa û rewayiya mafê neteweyî yê Kurd û azadî û buhagiraniyên vê neteweyê raxînin ber çavan, û bikin remza berdewamiya li ser xebat û pêdagiriya li ser mafên xwe.

Şanazî ye ji bo xelk û rêberên Kurdistana Rojhilat ku tu yek ji rêberên wê, bi mirina xwezayî koça dawiyê nekirine, û berdewam ji aliyê deshilat-



Pêşewa Qazî Mihemed:“Bizanin ku ez ew kes nebûm ku di dema metirsiyê de birevim. Çûbama kuderê? Ev der Kurdistan e, û nîştimana min ya pîroz e, û ez gora heşt pişt ji bav û kalên xwe nas dikim”.

darên Îranê ve pilana kuştinê ji wan re hatiye darêtin û necamêrane hatine şehîdkirin.

Vê rastiyê jî em baş dizanin ku pêşewayê mezin di dema girtina xwe de, hewcehiya wî bi parêzeran nebû, û di dawî bergirîkirina xwe de bi eşkereyî gotiye: “Wisa tê negihîjin ku ez ji yasayên we, agehdar nînim, bi tewahî min dizanî ku berî vê ku arteş Mehabadê dagîr bike, ezê bême bidarvekirin, û her demekê jî ku min hez kiriba min dikarî ez xwe rizgar bikim, lê bizanin ku ez ew kes nebûm ku di dema metirsiyê de birevim. Çûbama kuderê? Ev der Kurdistan e, û nîştimana min ya pîroz e, û ez gora heşt pişt ji bav û kalên xwe nas dikim”.

Ew gotinên zêrîn ji devê rêberekî derketine ku di roja hilbijartina xwe ya ji bo serkomariyê de bi qur’ana pîroz û alaya Kurdistanê û şerefa xwe sond xwariye ku heya dawî dilopa xwîna xwe gelê xwe bi cih nehêle, û bi can ji aliyê rejîmên zal bi ser Kurdistanê ve, û bi taybetî ji aliyê deshilata cehnemî ya Komara Îslamiya Îranê ve dom heye, ku niha bi ser Kurdistana Rojhilat de deshilatdariyê dike. Diyardeya pîs ya terorîzmê jî ku tu carî pêsîra Kurdan bernedaye, rêberên wekî Dr. Qasimlo û Dr. Şerefkendî û bi sedan xortên din di hemû beşên Kurdistanê de, ji himbêza Kurd derxistine. Terorîzma DAÎŞ’ê jî pêsîra Kurdan di Kurdistana Başûr û Rojava de, bi awayekî eşkeretir girtiye. Terorîzma dewletî ya cudanekirî ji naweroka Komara Îslamî jî bi awayên cur bi cur, wekî DAÎŞ’ê di cihê xwe de ye, û bi giştî neteweya Kurd di rewşeke dijwartir de ye, lê bi xweşî ve şîretên Pêşewa Qazî Mihemed derheq yekgirtina Kurdan bo parastina xaka Kurdistanê û derbazbûn ji rewşa dijwar bi awayekî hejî berçav tê girtin, û xortên neteweya Kurd di xebata li dijî vê terorîzmê de bi awayekî serkevtî bûn ku dengvedaneke cîhanî hebûye, herçend ku karwanê şehîdên Kurdan zêdetir kiriye.

û mal pêşmergeyê Kurd û Kurdistanê be.

Di 10’ê Xakelêweya îsal de, em di demekê de, wan şehîdan bi bîr tînin, û emegnasiya xwe di hemberî wan de nîşan didin ku Kurdistan û neteweya Kurd di piraniya beşên Kurdistanê de, di bêmafiyê de hatine ragirtin, û serkut û işkence û bidarvekirina xortên neteweya Kurd bi tawana mafxwaziyê

Lewra di vê boneyê de em rêz digrin ji xweragiriya Kurdan li şerê li dijî terorîstan de, û silavan dişînin bo riha wan şehîdên ku canê xwe kirine goriyê parastina xaka Kurdistanê û neteweya Kurd.

Beşdarên birêz yên rêûresma 10’ê Xakelêwe, roja şehîdên kurdistanê!

Erka li ser milên her Kurdekî dilsoj û nîştimanperwer e ku di vê rojê de bi serdankirina malbatên şehîdan û bi danîna qevdên gulan li ser mezarê şehîdan û bi pêkanîna rêûresmên bi bîranîn û emegnasiyê ji bo şehîdan, hesta geldostî û Kurdperwerane ya xwe bi awayekî nîşan bidin ku hêjayî ezîzên me yên jidestçûyî be, û tenê di vê rojê de em sînordar nekin, û pêragihîştin û pêgehandina yadgarên şehîdan, wate xortên wan şehîdan, em bi erka li ser milên xwe bizanin, û nehêlin ku pêvajoya jiyana xwe di bênaziyê de derbaz bikin.

Pêşewayê Kurdan, derd û êşa civatên xelkê Kurdistanê destnîşan dike, û kilîda dergehê bexteweriyê dide wan, û xwendin û avakirina xwendingehan, û perwerdekirina zana û pisporan, û yekîtiya di nav Kurdan de, ji dersên pêşewayê nemir in.

Di vê rojê de cardin, em silavan dişînin bo riha pak ya tewahiya şehîdên riya rizgariya Kurdistanê û bo canê pak yê pêşewayê nemir Qazî Mihemed serqafileyê şehîdan, û hevalên wî Seyfê Qazî û Sedrê Qazî.
Hêvî û armancên wan bêne cî.

Serkevtî be, xebat ji bo gihîştina bi azadî û mefê neteweyî û dadperwerî û wekheviyê

PDKÎ
Komîsyona Civakî
10.01.1394
30.03.2015

www.agirin.org

Armancên şerê Helebçe (beşa 2 û dawî)



Mihemednezîf Qadirî

Ya yekemîn: Armanca rejîmê ji bo êrîşkirina rejîmê li ser herêmên Helebçe û Şarezûrê bi wan lêkdaneweyên çewt, ew bû ku herêmekê di bakûra Îraqê de ji bo opozisyona wê demê ya Îraqê di Başûra Kurdistanê de rizgar bike, û opozisyona Îraqê di nav navxwe ya Îraqê de vegeşîne. Bo vê armancê jî di civînên berpirsyarên bereya Kurdistanî û rejîma Îranê di kirmaşanê de biryar li ser hate dan.
Duyem: Di rewşekê de ku hêzên rejîma Îranê li eniyên şer ên başûr û nawerast de, di hemberî êrîşên arteşa Îraqê de, berbirûyê têkşikan û bêçareyiyê bûn, rejîm di hewla vekirina bereyeke din ya şer di herêmên çiyayî ên Kurdistanê de, bi armanca paşekêşepêkirina bi beşek ji hêzên Îraqê û mijûlkirina wan bi şerê Kurdistanê û sivikkirina vê zextê bû, ku di eniyên başûr û nawerasta Îraqê de, li ser hêzên wê hebû.

Sêyemîn: Hewla rejîma Îranê bo veqetandina riya sereke ya Silêmanî-Bexdayê û pêşrewiya hêzên wê ji bo girtina çiyayê Qeredaxê, û girtin û zirarpêgehandina çalên petrolê ên Kerkûkê bû. Êrîşa hêzên rejîmê û şerê Helebçe bo girtina bendava derbendîxan û derbazbûna hêzên wan ji çemê Sîrwan ber bi avahiyên "Ehmed Birnew" û hwd..., ku piştre ji aliyê hêzên Îraqê ve hatin tunekirin, her ji bo vê armancê bû.

Çarem: Xaleke girîng û nepenî û ranegehandî ya êrîşa li ser Helebçeyê pêywendiya wê bi PDKÎ ve hebû. Ji destpêka tevgera rizgarîxwaziya Rojhilata kurdistanê ve heya wê demê herêma Hewraman, Ciwanro, Newsûd, û gundên Deretifê, Hawar, û Haware kon, bibûne herêmeke azad, û PDKÎ ji bo birêvebirina karûbarên gundên wê herêma azad, sîstemeke xwebirêvebiriyê pêk anîbû, û xwendingeh bi zimanê Kurdî, bo xwendekarên wê herêmê ava kir, û desteyek ji mamostayan bo birêvebirina vê erka neteweyî perwerde kir, û dermanga û xizmetguzariyên tendurustiyê ji bo wan dabîn kir, û bazareke derfiroşkirin (hinardekirin) û anîna kalayan digel bazarên Helebçe û ... rêk xistibû, û bernameya wergirtina gumrikê danîbû, û ewlehiya herêmê ji hêla pêşmerge ve hatibû parastin. Girîngiyeke zaf bi parastina jîngeha herêmê û şûna nîştecihbûna binke û baregehên PDKÎ hatibû dan, serbarê wan pêngavên xizmetkirinê, ew herêm bibû nawenda pêwendîgirtina PDKÎ di warê rêkxistinî ve digel bajarên parêzgehên Sine, Kirmaşan, Îlam û raserî Îranê.

Bi giştî ew herêm, di wê demê de, tenê herêm li raserî Kurdistanê de bû ku di destên hêza pêşmerge û PDKÎ de bû. Lewra bibû cihê bala ragehandinên giştî, û berdewam nûçegihanên biyanî û opozisyona Îranî serdana wê herêmê dikirin, û bas ji taybetmendiyên demokratîk ên PDKÎ û şêweya wê birêvebiriya pêşkevtî dikirin. Ew piropagendeya ku di ragehandinan de dihate kirin, serbarê çalakiyên leşkerî ên hêza pêşmerge li dijî hêzên rejîmê, bi tewahî seranên rejîmê tengav kiribû, û karîn ji vê derfetê, ku hêzên bereya Kurdistanî jî, di êrîşa wan ya bo ser Helebçeyê de digel ketibûn, ji bo gihîştina bi armancên xwe ji vê deverê mifahê wergirin û êrîşê bikin, û wê herêmê bigrin. PDKÎ neçar ma ku di vê qonaxê de, ber bi cihên din binke û baregehên xwe veguhêze, û bibe aliyekî zirarmend di vî şerî de. Bi giştî ew xalên ku min îşare pê kirin, ji armancên bingehîn ên vî şerî bûn, û di asta Kurdistanê de jî eva yekem pilana hevbeş ya hêzên siyasî ên Başûra Kurdistanê piştî pêkanîna bereya Kurdistanî bû.

Tiştek ku dixwazim bas bikim, axivtinên Haşimî Refsencanî serkomarê wê demê yê Îranê li ser şerê Helebçeyê ye. Dema ku hêzên Îranê Helebçe girtin, Refsencanî got ku herêma herî mezin ya bakûra Îraq û Kurdistanê me girtiye, deşta bi pêt û bereket ya Şarezûr û pira stratejîk ya Zelmê me girtiye, ku di warê siyasî û leşkerî û aborî de, deskevta herî mezin ya vî şerî ye, xeynî vê yekê ku tewahiya hêzên Îraqê di vî şerî de ji nav çûn, û bi dîl hatin girtin. Lê piştî çend mehan û piştî girtina bajarê Helebçeyê ji aliyê hêzên arteşa Îraqê ve, ku bo girtina vê herêmê êrîşeke baş kirin ser hêzên Komara Îslamî di vê herêmê de, û her bi vî awayî ku çend mehan pêştir hêzên arteşa Îraqê di êrîşa hêzên pêşmerge û hêzên Spaha Pasdaran a rejîma Îranê de hatin tunekirin, vê carê hêzên Îranê tûşî vê çarenûsê bûn, û berbirûyê meztirîn têkçûnê ji destê arteşa Îraqê bûn, û herêm bi tewahî kete destê arteşa Îraqê de. Di vê têkçûnê de Refsencanî got ku ew herêm ne cihê çandiniyê bûye, û ne jî tu berhemek ji me re heye, û ne jî girîngiya erdnîgariya wê heye. Ji bihîstina axivtinên wî zatî, mirov ew gotina tê bîrê ku: "Bîrdanka derevkeran ze'îf (lawaz) e".

Serbarê vê ku di şerê Helebçe de xelk û xaka vê herêmê bûne sotemeniya vî şerî, lê xaleke erênî ew bû ku dengê belengaziya gelê Kurd gihande civaka navneteweyî, û tawanbarên vê cinayeta bi sam, bi raya giştî da nasandin, û goriyên Helebçeyê, bûne nasnameya neteweyeke bê maf. Niha piştî derbazbûna 27 salan bi ser vê êrîşa dijî mirovî û vê komkujiyê re, em dibînin ku Helebçe bajarê xwîn û xebatê, dibe yek ji wan pênc parêzgehên herêma Kurdistanê, û di hola monomênta şehîdên Helebçeyê de, di civîneke fermî ya endamên parlêmênta Kurdistanê, û nûnerên parlêmênta Îraqa federal de, biryara parêzegehbûna vê devera bi xwîn tê dayîn. Cihê xwe ye ku ew deskevta siyasî ji malbatên şehîdên Helebçe û xelkê wê herêm pîroz bikim, û silavan jî bişînim bo riha pak ya şehîdên kîmyabarana Helebçeyê, û hemû wan xortên aza û cesûr ku di çepera parastina Kurd û Kurdistanê de, riha xwe kirin goriyê armancên gel û nîştiman. Herwisa em serê rêz û hurmetê bo bazên bilindfir ên PDKÎ û pêşmergeyên qehreman ên hêza Şaho ditewînin, ku bi qehremantiya xwe ew dîroka pirr ji serwerî ji bo gelê xwe tomar kirin. Di vî şerê hemasî de, xeynî van çend pêşmergeyên qehreman ku şehîd bûn, sê pêşmerge jî di hêza Şaho de bê serûşûn bûn, ku navên wan bi vî awayî bûn: Mîr Ehmed Ehmedî xelkê gundê Mezîdî, û Mihemed Selîmî naskirî bi Hemeyê Naze, xelkê Bayingan bûn, ku niha her du jî şehîd in. Ew ku wê demê ketibûn nav lepên hêzên Îraqê de, piştî çend mehan hatin berdan. Pêşmergeyeke din ê qehreman jî bi navê Enwer Derebeyanî, niha jî bêserûşûn e, û bû serbazê bênav ê vî şerî.

Xaleke din ya cihê baldanê ew bû ku rêberên nemir Dr. Qasimlo û Dr. Şerefkendî di dema şer de, digel fermandarê hêza pêşmergeyên PDKÎ û digel berpirsyarên payebilind ên PDKÎ di vî şerî de di pêwendiyê de bûn, û gellek nîgeranê qedera wê hêzê bûn, lewra di sibêdehiya 01.01.1367 (1988)'an de, dema ku hêzên me ji şerê Helebçe û ji dorpêça leşkerî rizgar bûn, rêberê mezin Dr. Qasimlo ji hêza pêşmerge pêşwazî kir, û di kempa awareyên Rojhilata Kurdistanê li Barîke de, civîneke berfireh û dîrokî ji wan re pêk anî, û pîrozbahiya wê serkevtinê ku hevdem bû digel cejna newrozê li xelkê kir, û kêfxweşiya xwe û PDKÎ ji bo serkevtinê eşkere kir. Her di vê civînê de mixabiniya xwe ji kîmyabara Helebçeyê û şehîdbûna zêdetir ji 5 hezar kesî ji xortên nîştimanperwer ku bêrehmane ji aliyê dijminên Kurd ve hatibûn şehîdkirin eşkere kir, û herwisa îşare bi şehîdbûna pêşmergeyên Komele kir ku di vî şerî de ketin boseya hêzên Îranê de, û canê xwe gorî kirin, û bi boneya vê bûyera bi zirar sersaxî da Komeleyê.

Her di vê rojê de tişteke gellek nexweş ku rû da, ragehandina daxûyaniya cudabûna wan kadr û pêşmergeyan bû ku li dijî encama kongireya heştemîn ya PDKÎ bûn, wan hevalan bi vê kiryarê ew serkevtina mezin ku di şerê Helebçeyê de pêşmergeyên PDKÎ di dîroka pirr ji şanazî ya PDKÎ de tomar kiribûn, bi awayekî daposî, û xelkê Kurdistanê çi qas bi vê serkevtinê dilxweş bûn, ew qas jî bi cudabûnê berbirûyê nîgeraniyê bûn, û piştî bilavbûna vê daxûyaniya cudabûnê Dr. Qasimlo got ku ew cure kiryar, nikarin pêngavên tekoşerên demokrat ji xebatê sist bikin û kadr û pêşmergeyên PDKÎ her wek ku di taqîkariyan de serbilind û serkevtî bûn, di vî warî de jî wê biselimînin ku alahilgirê rastîn ên rê û şopa demokrat in. Herwisa di 27'emîn salvegera kîmyabara Helebçeyê de, ez bi erkeke neteweyî û siyasî dizanim ku spas û pêzanîna xwe pêşkêşî wê desteya pêşmerge û gelê xwe, birêzan Hemeyê Hacî Mehmûd sekreterê Partiya Sosyalîst a Kurdistanê, Kak Hamid Hacî Xalî fermandarê emeliyata Helebçeyê û tekoşerê kevnar ê Kurd Kak Mela Fayiq û Omerê birayê wî bikim ku heya demên dawiyê yên derbazbûna me, alîkariya PDKÎ kirin.

Herwisa şehîdê nemir birêz Şewketê Hacî Moşîr bi bîr tînin, ku gotina wî ya balkêş hertim di guhên min de deng vedide, ku di civîneke me ya hevbeş de, di "Çavgî Bawakoçek" de rû kire fermandarên YNK'ê û got: "Çi ji dest me tê, bila em ji bo PDKÎ bikin, û bila em şermezarê dîrok û PDKÎ û Kurdên Rojhilat nebin, heya hekî em Helbeçeyê jî bi nirxa derbasbûna PDKÎ ji dest bidin, ji bo me serkevtin e". Di çarçoveya pilana derbazbûna me de, em nikarin ku îşare bi rola kadrê bi vec ê YNK'ê Kak Mihemed Mihemedemîn naskirî bi "Heme siyasî" nekin ku yek ji wan kesan bû ku tewahiya dema xwe ji bo alîkariya me danî.
Qurbanîdaneke din ya Partiya Sosy-

www.agirî.info

alîsta ya Kudistanê di dema birêvebirina vê erka neteweyî û nîştimanî de, ew bû ku bi sedema pêdagiriya tekoşerê kevnar ê gelê me Hemeyê Hacî Mehmûd, di dema vegeriyana wan de, ku pêşmerge bi rê kirin, di quntara çiyayê Sûrên di herêma Şarezûrê de, du pêşmergeyên qehreman yên Partiya Sosyalîst bi navên Hacî Ebdullah Siyamêwe, Amir herêmê 21, yê Partiya Sosyalîst, û Kak Osman Qaynêce, pêşmergeyê qehreman yê vê partiyê şehîd bûn ku ji riya hevkarî û hevxebatî digel têkoşerên PDKÎ û armancên gelê Kurd di rojhilata Kurdistanê de canê xzwe yê şîrîn gorî kirin. Xaleke din ku yekem car e ku em îşarê pê dikin, destbiserkirina siyasetvanê mezin yê gelê Kurd Dr. Mehmûd Osman bû, bi sedema alîkariya Partiya Sosyalîst digel me, ku bo heyama zêdetir ji pênc rojan ji aliyê dezgeha Îstixbarata Îranê ve hate girtin, ku bi wî ragehandibûn ku partiya we li Helebçê alîkariya PDKÎ kiriye, ku ew jî bi sedema xwezaya neteweyî û nîştimanperwerî û pêwendiya kevnar digel Dr. Qasimlo û PDKÎ, bi wan gotibû ku ez agehdarê vê pirsê nînim, û hekî tiştek wisa jî hebûye, me tişteke neteweyî encam daye. Her di vê derheqê de dema ku Dr. Mehmûd çavên wî dikevne Hemeyê Hacî Mehmûd vê pirsê ji wî dike, û ew jî vê nûçeyê piştrast dike, û Dr. Mehmûd jî destxweşiyê ji wan dike.

Pêwendiya siyasî ya hêzên Bereya Kurdistanî û PDKÎ ew ezmûna bi nirx di vî şerî de wekî dîharî anî, û bi dijmin û neyarên tevgera Kurd nîşan da ku eva her hûn nînin ku li dijî me yek digrin, û hekî Kurd jî yekgirtî be, ku hewcehiya dîrokî jî vê yekê ji me dixwaze, dikare pilana neyaran pûç bike, û îradeya neteweyî ya xwe nîşan bide, ew alîkarî û dehan alîkariyên din ew rastiya selimandiye. Birêz û hurmet be, yad û bîranîna şehîdên Helebçe, û yekgirtîtir bin partî û aliyên siyasî ên Kurdistanî.

Pêşmergeyekî PDKÎ koça dawiyê kir



Kurdistanmedia: Silêman Sabirî pêşmergê PDKÎ piştî du salan berberekaniya di gel nexweşiyê, mixabin di nexweşxaneyeke Hewlêrê de koça dawiyê kir.

Navbirî kurê Xidir û xelkê gundê Nerzîweya bajarê Şinoyê bû, û birayekî wî bi navê Kerîm di sala 1983'an de şehîd bûye.

Silêman Sabirî sê salan piştî şehîdbûna birayê xwe bû pêşmerge, û heya dawiya jiyana xwe bi rêbaza demokrat emegdar ma.

Termê navbirî di nav aporaya kadr û pêşmergeyan de, û bi beşdariya Komîsyona Siyasî-Nizamî a PDKÎ di goristana şehîdên demokrat di Cêjnekanê de bi axê hate spartin.

PDKÎ bi vê boneyê ve sersaxiyê dibêje xizm û kes û kar û herwisa hevçeperên şehîd Silêman Sabirî.

.



Teymûr Elyasî: "Îranê 5 peymanname ji koma wan peymannameyên navnetewî ku pejirandine, bi hêcetên taybetmendiyên kulturî û şerî'eta Îslamê binpê kirine, û rêzê ji wan peymannameyan nagire".

Rojên 27-28'ê Adara sala 2015 (Xakelêweya 1393)'an, konferansek taybet bi mafên neteweyî ên Îranê li jêr navê "diyalog li ser mafên girûpên êtnîkî di Îranê de" bi beşdariya nûnerê PDKÎ birêz Dr. Elî Ebdîlzade di welatê Swîsê de bi rê ve çû. Rojnameya Kurdistanê bona bidestxistina zanyariyên zêdetir di vê derheqê de û çawaniya birêveçûna konferansê û naweroka panêlê û mijarên wê, hevpeyvînek tevî birêz Teymûr Elyasî, berpirsê Komeleya Mafê Mirovan li Kurdistana Îranê- Jinêvê pêk anî û deqa gotûbêjê bi vî awayî ye:



H: Arif Vêlzî

Kurdistan: Kak Têymûr, Şîrîn Îbadî di vê konfiransê de ragehandiye, ku me wate netewên Îranê, heya niha derfeta vê yekê tunebûye ku bas ji kêşeyên xwe bikin, bi baweriya we Şîrîn Îbadî bi xwe heya çi qasî bawerî bi mafê neteweyî yê netewên Îranê heye?

Teymûr Elyasî: Belê gotinên Xatû Şîrîn Îbadî derheq bi nebûna derfetek rasteqîne bo xistine ber bas a pirsa neteweyan di Îranê de rast e, lê li derveyî welat, Komeleya mafên mirovan a Kurdistana Îranê – Jinêv, bo heyama pitir ji 10 salan e ku bi awayekî sîstimatîk konfirans û civînan li parlemanên Ewropa û netewên yekgirtî li ser pirsa netewên Îranê pêk tîne û, eva jî bo cara çeremîn e ku xatû Şîrîn Îbadî û Ehmed Şehîd bi xwe mêhvanên konfiransa me ne. Derheq beşa duyemîn a pirsyarê, her weke em dibînin, Rojhilata Navîn di guherînkariyên berdewam de ye, hatina DAÎŞ'ê û bihêzbûna wê di herêmê de û herweha herifîna dewletên herêmê, bûye handerek bona vê ku Îranî bîr ji çareyekê bikin bo pirsa neteweyan di Îranê de.

Diyarîkirina Yûnisî (Farsek) weke şêvirmendê Rûhanî bo netewên Îranê û, beşdariya xatû Îbadî di konfiransa pirsa netewên Îranê de zêdetir di vê rasterêyê de ye.

Kurdistan: Di vê konfiransê de nûnerê PDKÎ pêdagirî li ser vê yekê kiriye ku tenê rêya desteberbûna mafên netewên Îranê guherîna rejîmê ye, niha pirsyar ev e ku gelo beşdarên din ên konfiransê jî li ser vê baweriyê bûn ku take rê, guherîna rejîmê ye?

Têymûr Elyasî: Piraniya beşdarên konfiransa Komeleya Mafên Mirovan a Kurdistana Îranê – li ser pirsa netewên Îranê, li ser vê xalê hevhizir bûn ku piraniya madeyên yasaya bingehîn a Îranê li ser bingeha Îslama Şî'eya 12 Îmamî hatine avakirin, û yasayên ne baş in û hewce ye ku ser ji nû ve bêne sererastkirin. Pirofisor Ebas Welî yasayên bingehîn ên Îranê weke yasayek serkutkar bi nav kir.

Kurdistan: Çima heya niha rejîmê rê nedaye ku Ehmed Şehîd seredana Îranê bike? Di demekê de rejîm dibêje ku raporên Ehmed Şehîd dûr in ji rastiyan?

Têymûr Elyasî: Komara Îslamî ya Îranê tu baweriyek bi mafên mirovan û wan peymannameyên navnetewî nine ku pejirandine, serbarê vê yekê, Îranê diyarîkirina Ehmed Şehîd weke raporthinêrê taybetî ê NY ji aliyê Şêvra Mafên Mirovan ve, weke zexteke siyasî ji aliyê welatên Rojava ve bo ser Îranê dibîne û, bi tu awayekî rêya çûyîn bo Îranê nade wî. Îranê 5 peymanname ji koma wan peymannameyên navnetewî ku pejirandine, bi hêcetên taybetmendiyên kulturî û şerî'eta Îslamê binpê kirine, û rêzê ji wan peymannameyan nagire.

Kurdistan: Serbarê tewahiya wan raportan derheq bi binpêkirina mafên mirovan di Îranê de ku hemû jî xwediyê belgeyan in, çima heya niha helwêstek bi kiryar ji wan welatan nehatiye dîtin ku hertim bi erênî dengê xwe didin raportên Ehmed Şehîd? Bi baweriya we raportên weha tenê di çarçoveya pirotestokirinê de cih digire?

Dom R:6

www.arsiv.rakurd.org

Netirsiyan ji mirinê remza zindîmanê ye



Şemal Terxîbî

Sedsala bîstemîn, sedsala serhildana çendîn şoreş û serhildanên azadîxwazane û di heman demê de jî, zalbûna totalîtarîzmê bi ser beşeke berçav ji herêmên cîhanê de bû.

Sedsala du şerên cîhanî û bombeya navikî û dijayetîkirina piroseya cudahizrî û pêkanîna rewş û hewayê polîsî û tirsê û wekî Nîçe dibêje: "Di vê navberê de xwîna herî zêde bo çemkên wekî azadî û maf û .....rijiya".

Di rewşeke bi vî awayî de, û di Kurdistana bindest ya Îranê de sîstema serberedayî ya paşatiyê tawanek encam da, ku heta heta di dîroka Îranê de wekî lekeyeke reş dimnîne.

Di 10'ê Xakelêweya sala 1326 (1947)'an de, deshilatdarên wê demê yên Îranê çend kes ji rêberên ostoreyî yên Kurdan bi tometên nerewa di girtîgehên xwe de li dara bêdadiyê dan. Pêşewa Qazî Mihemed û Seyf û sedrê Qazî ew kesayetiyên bêhevta ên Kurdan in ku di vê rojê de hatin şehîdkirin, eşkere ye ku felsefeya jiuyana mirovan her di destpêka bûnê ve heya niha pêk hatibû ji jidayîkbûn û mirinê.

Ew du têgeh jî bi dirêjahiya temenê mirov berdewam cihê behs û nîqaşê bûye, û her kes li gora dîtina xwe berhev dide, û pênaseyê jê re dike. Hinek kes baweriya wan bi cîhaneke din û zindîmana paşmerg heye û hin kesên din jî li ser vê baweriyê ne ku eva pêvajoyeke xwezayî ye û piştî nemana di vê cîhanê de tu jiyaneke din tuneye.
Di her du awayên baskirî de, hest bi şêweyek ji tirsê ji bo pirsa mirinê tê kirin.

Lê di vê navberê de hin kes hene ku ne tenê ji mirinê bi wateya wê ya rastîn natirsin belkû em dikarin bêjin ku bi mirinê dikenin û bi kiryarên xwe yên mirovî berbirûyê mirinê dibin û heya mirinê dixin qedeman û di heman demê de jî dibin sembolek bo nivşên piştî xwe û ew "netirsiyan ji mirinê" dikin waneyeke mezin bo jiyanê. Bi vî awayî jî jiyan ji rewşeke asayî ve tê veguhastin bo jiyaneke manadar û pirr nawerok ku renge bikarin vê yekê bo xala cudakirina mirovên asayî û mirovên mezin danên.

Niha li gora vê pênaseyê bi dûr ji her cure dudiliyekê em dikarin bêjin ku pêşewa Qazî Mihemed ew mirovê mezin e ku wekî şehîdê nemir Dr. Qasimlo kerem kir: "Dema ku Pêşewa û hevalên wî hatin bidarvekirin, peyamek, û meşxelek da destê nivşên piştî xwe. Ew peyama çi ye?

Ew peyama ew e ku yên ku şoreşgerên rasteqîne ne, heya hekî bi dehan carî mirin jî li pêşberî wan be, heya serkevtinê, dest ji xebatê nakişînin. Ew peyama ew e ku hemû hewl û tekoşîna me bo bextiyarî û serbilindî û xweşiya gelê me ye, ew peyama ew e ku ji bo azadiyê, neteweyeke zindî dibe fîdakariyê bike.

Di vê riyê de karwaneke dûr û dirêj ji şehîdan me pêşkêş kiriye, lê neteweyek ku bixwaze zindî bimîne, neteweyek ku bixwaze nîşan bide ku serbixwe ye û di nav neteweyên cîhanê de cihê wî heye, dibe nirxa azadiya xwe jî bide.

Azadî jî her wekî ku dîrokê nîşan daye, nirxa wê giran e bê nirx jî nahê wergirtin. Ew peyam ew e ku em bo azadî û demokrasiyê tekoşînê dikin.

Îro rojê piştî derbasbûna 68 salan bi ser şehîdkirina serkarwanê karwanê şehîdên Kurdistanê re, erka nivşa nû ya Kurdistanê ye ku herwek serdarê demokrasiyê kerem kir, riya şehîdan bidomîne heya ku bigihîje azadiyê.

Azadiyek ku tewahiya aliyên jiyana mirovekî bi wateya rastîn ya peyvê bi xwe ve bigre, û gelê Kurd jî hevşêweyê hemû gelên cîhanê serbestî û azadiyê tam bike, û ji mirinê nesilike û berevajî berbe canê merg û mirinê, û nehêle ku meşxela xebat bo azadiyê vemire.

Her di vir de hewce ye ku em bi bîr bînin ku xebata Pêşewa û hevalên wî, çend armancên bilind yên mirovane li pêşiyê hene ku pêk hatiye ji: Vegeşandina dostatiya di navbera takên civakê û neteweyên cîhanê, û vegeşandina çemka aştiya neteweyî û dûrketina ji tundûtîjiyê û herwisa bo jinavbirina nedadperweriyê û bo serwerî û yeksaniya takekesan ku remza gihîştina bi van armancan in, bêguman çandina tovê hêviya bi pêşerojê û yektir hezkirinê, û rêzgirtina ji yektir e.



Nivşa îro rojê ya Kurdistanê dibe bi başî ji vê yekê têbigihîje ku rejîmên totalîtar û dijî gelî yên wekî komara Îslamiya Îranê, berdewam di hewla vê yekê de ne ku bi çandina tovê bêhêvîtiyê û bêbuha nîşandana xebata gelên azadîxwaz û gelê Kurd, ji tamkirina gihîştina bi azadiyê dûr bixin, û bêhêvîtiyê bikin hêvinê jiyana wan.

Lewra berdewamiya li ser xebatê û hewldan bo gihîştina bi armancên pêşewa û Komarê, altirnatîva herî baş e bo vê doktorîna rejîma Îranê û rejîmên wekî wê.

Roja 10'ê Xakelêwe roja rêzgirtinê ye ji wan xortên çavnetirs ên Kurdistanê ye ku bi riha xwe parêzgarî ji keramet û şerafeta neteweya Kurd kirin û canê xwe kirin pirebaska serkevtinê û gihîştina bi armancên ji mêjîn ên gel.

Roja peyman û soz nûkirinê ye digel wan mirovên mezin ku mana bi jiyanê bexşîne, û merg şermezar kirin, roja pêdagirîkirinê ye li ser tewahiya wan têgehên me'newî ku wateyê didin mirovahiyê, û lêborîn, kolnedan, jixweborîn, cangorîtî û dehan çemkên din bi vî rengî pênase dikin.

Doma R: 5



Teymûr Elyasî: Şêvra Mafên Mirovan a NY li Jinêvê û Civata Giştî ya NY li New York, hemû salekê Îranê derheq bi binpêkirina mafên mirovan şermezar dikin.

Lê bona vê yekê ku biryarname tenê li ser kaxezê nemînin û pêngavên bi kiryar bona cîbicîkirina wan bên avêtin, hewce ye ku pirs û dosiyeya binpêkariyên mafên mirovan di Îranê de, ji bo konseya ewlekariyê bêne şandin, yan jî Îran konvansiyona Romê bipejirîne. Îran konvansiyona Romê napejirîne û Çîn û Rûsiye jî bi sedema qazancên aborî, li ser rêya pejirandina her biryarnameyekê li dijî Îranê dibin asteng.

Kurdistan: Sedem çi ne ku welatên weke Çîn, Rûsiye, Kûba, Pakistan û Vênêzu'êla serbarê hebûna wan hemû belgeyan, dengê nerênî dane raporê?
Teymûr Elyasî: welatên navbirî bi du sedeman piştevaniyê ji Îranê dikin: Yekem ev e ku ew welat bi xwe mafên mirovan binpê dikin û pirsa mafên mirovan ji bo wan ne girîng e, û ya duyemîn ev e ku xêncî Pakistanê ku hevsînorê Îranê ye ku welatek Îslamî ye, hemû welatên din di bilûkek siyasî de li dijî Amerîkayê ne.

www.rasiva.org

Nerîna Lîderan



Maykil Haydên:

“Hekî di pirsa navikî de lihevkirin çêbe, herêma Rojhilata Nvaîn wê bikeve metir-siyê de”.



Mensûr Hadî:

“Rejîma Îranê Ye-men kavil kir”.



Beşar Esed:

“Rûsiye, Îran û Sûriye yek arman-ca wan heye”.



Mela Mezher:

“Bexdadî bêhnek genî bû, ku rûyê xelafetê jî heri-mand”.

Saleke nû, û diruşmeke din





Şehab Xalidî

Rêberê Komara Îslamiya Îranê Elî Xamineyî ji sala 1378 (1999)’an şûnda hemû salekê navekê bo sala nû ya Rojî diyarî dike û daxwazê ji berpirsyarên payebilind ên welat dike ku hemû hêz û şiyana xwe bi kar bînin bona vê ku di çarçoveya wê nav yan diruşma ku wî diyarî kiriye, bi awayekî pêngavên bi kiryar bo nehêlana kêşe û aloziyên di nav welat de hilgirin, ku di berjew-endiya nizama wan de be.

Lewra îsal jî bi baldan bi vê ku xelk bi sedema diruşmên birîqedar û bê encam ên dewletê derheq çareserkirina kêşeyên wan ji dewletê bêhêvî bûne, û rêberê nizamê jî ku bi xwe sebebkarê sereke ê pêkhatina vê rewşa nebaş e, bi başî ji vê rastiyê têgihîştiye, bi diyarîkirina diruşma “dewlet, xelk, hevdilî û hevzimanî” dixwaze xelkê be-lalêdayî ê welatê me cardin bi diruşmên bê kiryar ên dewlet û hikûmeta xwe hêvîdar bike.

Ji aliyekî din ve, digel vê ku ew peyama Xamineyî diselimîne ku kêşeyên kûr di navbera xelk û dewletê de hene, di heman demê de jî, nîşan dide ku armanc û daxwaza Xamineyî jî ne ew e ku dewlet daxwaziyên xelkê cî bi cî bike, belkû her çawa ku di peyama xwe de bas ji beşdariya berçav ya xelkê welat bi qewlê xwe di rêpîvînên 22’ê Rêbendanê û roja Quds de dike – ku di van rojên taybetî de rejîm bi anîna xelkê bi zorî ber bi kolanên bajaran, dixwaze xelkîbûna deshilata xwe bise-limîne- armanca wî ew ku xelk bi hemû awayekî di xizmeta wî û deshilata wî de bin, û ji bo berjewendiya nizamê, dev ji xwestekên xwe berdin, û bi yek dil û yek zimanî di hemberî dijminên Îslamê de (ku ew bi xwe nûneratiya vê cure Îslamê dikin!) bisekinin, û bi berxwedaniya xwe rê ji bo hinartina şoreşa Îslamî bo derveyî sînorên Îranê -her wekî ku niha em dibînin di welatên wekî Sûriye, Îraq û Yemenê de dike-xweş bikin.

Lewra xelk bi başî ji niyetên rêberê nizamê û berpirsyarên din têgihîştine, û niha ew bêbaweriya bi dewletê di asta teqînê de ye. Ji ber ku sala ku derbas bû jî, ji bo xelkê Îranê saleke pirr ji êş û azar û girtin û îşkence û îdam, û saleke reş û biyomtir ji salên berê bû, û dîsan hate selimandin ku Rûhanî jî ne dixwaze û ne jî dikare di çarçoveya vê sîstemê de guherînkariyan bike.

Em dikarin bêjin ku xelkê welatê me di çarçoveya vê nizamê de, ne tenê nikarin pêngavekê jî ber bi pêş ve bavêjin, belkû roj bi rojê wê zêdetir berbirûyê bi hezaran diyardeyên kirêt û nehez yên

Xamineyî bi diyarîkirina diruşma “dewlet, xelk, hevdilî û hevzimanî” dixwaze xelkê belalêdayî ê welatê me cardin bi diruşmên bê kiryar ên dewlet û hikûmeta xwe hêvîdar bike

civakî bibin, û hejarî jî wê roj bi roj zê-detir geviya wan bigivişîne, û wê stûyê wan zirav bike, û astengiyên zêdetir ji salên borî, li ser riya çalakiyên wan yên medenî wê bêne pêkanîn.

Belê welatê me ku diviya niha di refa dewletên herî pêşkevtî ên herêm û cîhanê de bibûya, mixabin di bin siya deshilata wan zaliman de, di kûrahiya kêşeyên cur bicur ên civakî û aborî de wisa bat bûye, ku tenê hiloşîna wê sîstemê dikare bibe destpêkek bo avedankirina Îraneke demokratîk û pêşkevtî. Îranek ku êdî rêberên wê di peyamên xwe yên newrozî de, şanaziyê bi xizmetên xwe yên sala borî bikin, û xelk jî şanaziyê bi hebûna wan rêberên xwe bike ku şev û rojên xwe kirine yek bo bextewerî û jiyaneke asûde ji bo wan. Bê guman wê demê ye ku xelk û dewlet dibin yekdil û yekziman ji bo pêşvebirina welatê xwe.

www.arşivakurd.org

Amîn Xusrewî: “Hilbijartina rê û rêbaza PDKÎ ku bi baweriya min her doma rêbaza Qazî û Qasimlo û Şerefkendî ye, erkek netewî ye, û min bê tu çavnihêriyekê ev rêbaza han hilbijartiye”.

H: Arif Vêlzî



Amîn Xusrewî digel hevjînê xwe birêz Seyîd Elî Rehmanî

Xwe gorîkirin û qebûlkirina jiyaneke pirr ji zehmetî û awareyî û derbiderî ji aliyekî, û ji aliyê din ve perwerdekirin û xwedîkirina wan zarokan ku hêviyên gelê xwe ne, û pêşeroja gelê xwe yê zulmlêkirî garantî dikin, di rastî de cewher û regnvedana jiyana wan jinan e, ku hemû temenê xwe di nava refên PDKÎ de, û bona gihîştin bi armancên bilind ên partî û gelê xwe terxan kirine, û dûr ji tu çavnihêriyekê, bi salan e ku mil bi milê hevjînên xwe ên pêşmerge, tevgera netewî-demokratîk a gelê Kurd li Kurdistana Rojhilat bi rêberiya Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê li ser piyan radigrin, û ber bi pêşve dibin.

Lewra di cihê xwe de ye ku her Kurdekî xwedî vijdan, serê rêz û hurmetê di hember jiyana we ya tejî ji zehmetî, lê binirx û xwedî buha de bitewîne.

Eva jî jiyan û serpêhatiya yek ji wan jinan e ku rêya berxwedanê kiriye armanca sereke a jiyana xwe:
Birêz Amîn Xusrewî keça Bawe, sala 1953 (1332)’an di bajarê Kurdperwer ê Sinê de hatiye dinê.

Amîn Xusrewî derheq jiyana xwe ya hevpar dibêje ku: “Sala 1969 (1348)’an min û hevjînê xwe Seyîd Elî Rehmanî jiyana xwe ya hevpar ava kir, û berhema jiyana me jî sê kur û du keç in. Kurê me yê yekemîn Azad e ku niha pizîşkê zarokan e, Kurê duyemîn Hîwa ye ku xwediyê bawernameya dîplomê ye, kurê din bi navê Hêriş pizîşkê didan e, û keça me ya mezin bi navê Arezû lîsansa ziman heye, û keça din bi navê Hana jî lîsansa civaknasiyê heye”.

Amîn Xusrewî piştî derbazkirina para zêdetir a temenê xwe ya siyasî di awareyî û derbideriyê de, çavnihêriya xwe derheq bi PDKÎ û derheq bi hevjînê xwe yê pêşmergê PDKÎ weha tîne ziman: “Hilbijartina rê û rêbaza PDKÎ ku bi baweriya min her doma rêbaza Qazî û Qasimlo û Şerefkendî ye, erkek netewî ye, û min bê tu çavnihêriyekê ev rêbaza han hilbijartiye.

Lê ez hez dikim ku Partiya demokrat jî zêdetir ji berê alîkar û handerê jinana di nav refên partiyê de, û li derveyî partiyê de be, da ku bikarin di xebat û tekoşînên xwe de serkevtî bin. Herweha hêvî û daxwaza min jî ev e ku havjîna min, weke salên berê xwediyê îradeyek bihêz û şiyanên taybet bi xwe be di pêvajoya xebat û kar û erkên xwe ên netewî de”.Amîn Xusrewî di doma hevpeyvîna xwe de roja herî xweş a jiyana xwe weha tîne ziman û dibêje: “Dema ku Kurdistana Başûr ji zulm û zordariya deshilata Sedam Husênê dîktator rizgar bû, û gelê me di wê para Kurdistanê de karî bi rihetî bêhnekê vede, ez jî weke mirovek azadîxwaz û jiyandost, pir kêfxweş bûm, jiber ku ez li ser vê baweriyê bûm û niha jî li ser vê baweriyê me ku azadiya parek ji xaka Kurdistanê, dikare bibe alîkar bo parên din ên Kurdistanê jî”.

Amîn Xusrewî herweha roja herî nexweş a jiyana xwe weha tîne ziman: “ Roja herî nexweş a jiyana min roja bihîstina nûçeya şehîdkirina şehîd Dr. Qasimlo bi destê dîplomat terorîstên Komara Îslamî bû, ji ber ku ez li ser vê baweriyê bûm ku şehîdbûna Dr. Qasimlo bûye sedema vê yekê ku Kurdistan û gelê Kurd rêberê xwe yê jîr û zana ji dest bide, û herweha cîhan jî kesatiyek weha azadîxwaz û rewşenbîr ji dest bide”.

Amîn Xusrewî di dawiyê de rû li dayîk û jin û keçên Kurdistanê dike û bi vê peyamê dawiyê bi hevpeyvîna xwe tevî Rojnameya Agirî tîne: “Weke jin û dayîkek Kurdistanê ku piraniya temenê xwe min di nava cîhana siyaset û refên PDKÎ de derbaz kiriye, peyama min ji bo dayîk, keç, jin û xûşkên Kurdistanê ev e ku her weke salên berê piştevanê bizava rizgarîxwaziya gelê Kurd bi giştî û bitaybetî partiya xwe wate PDKÎ bin, da ku bikarin heya gihîştin bi xewn û hêvî û armancên tevahiya şehîdên Kurdistanê, li ser xebat û tekoşîna xwe ya pîroz berdewam bin”.



www.ekurd.org

21’ê Adarê, roja cîhaniya xebata li dijî ferq û cudahiya regezî yan tepeseriya neteweyî



Îdrîs Stwet



Ferq û cudahiya regezî di cîhanê de û di nava neteweyên cîhanê de dîrokek dûr û dirêj heye, û vedigere bo sedsala 17’an û bitaybet li Qareya Afrîqaya Başûr de, ku spîpêstan siyaseteke zalimane derheq reşpêstên vê deverê girtine pêş, û armanc ji wê siyasetê cudakirina spîpêstan ji reşpêstan û zalbûna spîpêstan bi ser reşpêstan de bû. Lê di dawiyê de bi sedema hewl û xebatên zaf ên xelkê, ev siyaset vêde birin, û li sala 1965’an civaka navnetewî bo vê ku nefreta ferq û cudahiya regezî û tepeseriya netewî û koledariyê nemîne, 21’ê Adarê weke roja cîhanî ya dijî ferq û cudahiya regezî diyarî kirin.

Civaka navnetewî ferq û cudahiya regezî wekî binpêkirina mafên mirovan dizane, û hemû salê di cîhanê de roja 21’ê Adarê weke roja cîhaniya dijî ferq û cudahiya regezî tê bi bîranîn.
Lê niha jî ferq û cudahiya regezî di zaf welatên cîhanê de heye, û tenê jî girêdayî bi rengê pêst nine, belkû zaf taybetmendiyên din jî hene, û heya heke reşpêst jî di hin welatan de nebin, taybetmendiyên netewî bi xwe ve digire, wek ferq û cudahiya ziman, ol , netewe.

Di welatê Îranê de de, ferq û cudahiya regezî, taybetmendiyên netewî dikine armanc, û ji aliyê desthelatdarên Îranî ve derheq neteweyên din ên kêmanî zulm tê kirin, û neteweyên kêmanî di vîwelatî de dikevne ber êrîşên regezperestên desthilatdar ên Îranê, û desthilatdarên Îranê her di destpêkê de siyaseta regezperestiyê girtine pêş bo tepeserkirina xelk û neteweyên din di Îranê de.

Neteweyên kêmanî yên akinciyên Îranê hemû li ser vê baweriyêne ku siyaseta ferq û cudahiyê bandorek xirab li ser rewş û jiyana wan daniye, û bixasmanî ji mafên siyasî û civakî û olî bêpar in, û mafên wan hatine binpêkirin.

Ji aliyekî din ve siyaseta ferq û cudahiyê di welatê Îranê de derheq penaberan û bitaybet penaberên Efxanistanî di astek bilind de ye, wek kiryarên nemirovane yên polîsên vî welatî tevî penaberan, û sînordarkirina hatûçûna penaberan bo parêzgehên din û binpêkirina mafê xwendinê û ...hwd.

Cuda ji vê hizrek din di mêjiyê desthilatdarên Îranê de cih girtiye, ev jî eva ye ku zaf arîşeyên ewlehî û aborî û ferhengî xwe ji bo netewe û regezên din pêk tînin, û bi vê hizrê hewla mihkirina netewên din û regezên din didin.


Ji zarokan re helbestên Kurdî hate çapkirin


Li bajarê Îlamê yê Rojhilata Kurdistanê, ji bo cara yekemîn ji zarokan re helbestên taybet hat çapkirin.

Helbestvanê kurd ê îlamî Meysem Xuranî ku wek “Rasan” tê naskirin, du helbest ji bo zarokên di temenê 7-10 salî de nivîsîn û dane çapkirin.

Meysem Xuranî di webloga xwe de gotiye, ev cara yekemîn e li Îlamê helbest ji bo zarokan tê gotin û çapkirin.

Xuranî da zanîn, ew helbest ku ji 12 rûpelan pêk hatiye û bi wêneyan hatiye nexşandin, ji aliyê Saziya Kulturî-Edebî ya Bawe Jîre ve hatiye çapkirin.Wêneyên helbestan ji aliyê Çiya Fethî ve hatine kişandin. Navên wan helbestan ev in: “Korpe” (zarok) û “Ewr û Xor” (ewr û roj).





Gotinên Navdaran



A: Firat Cewerî

Yên ku bi serketina xwe bawer in, bi ser dikevin.
Vergilius

Yên ku baweriya xwe bi xwe tînin, dikarin dinyayê jî îdare bikin.
Voltaire

Xwedê ji kesên ku pesnê xwe didin, nefret dike.
St. Clement

Sedema ji hev heznekirina jinan, mêr in.
La Bruyere

Dilxerabî hîseke ku mirovan biçûk û nizim dike.
Tolstoy

Dilxerabî wek mar e, bi xwediyê xwe vedide.
Sophokles

Ne bi tenê li ruyê mirovan, li hundirê wan jî binihêrin.
Chesterfield

Mêr ji jinên zane nefret dikin.
Tennyson

Hunermendekî Kurd agir berda keda xwe

Hunermendê kurd ê Rojhilata Kurdistanê yê bi navê Kemal Ezîzî, makêteke bajarê kevnar ê Textê Silêman, ku di heyama 6 salan de çêkiribû, şewitand.



Li gorî malpera herêmî ya nîvfermî ya bi navê Ziryan, ku nûçeyên herêma Mukriyanê ya Rojhilata Kurdistanê belav dike, Kemal Ezîzî ji kerbê xemsariya rayedarên Rêveberiya Kulturê ya Bokanê agir berda keda xwe ya 6 salan.

Li gorî nûçeyê, wî hunermendê kurd beriya ku wê çalakiyê bike, gotibû ku rayedarên bajêr guh nadin ked û zehmetiya hunermendan lewma biryarek wisa dabû.

Makêta Textê Silêman, bi sê hezar parçe dar û texteyan hatibû çêkirin. Bajarê kevnar ê Textê Silêman, ku 45 km dûrî bajarê Tikabê yê Rojhilata Kurdistanê, paytexta Împeratoriya Mediya, Împeratoriya Sasanî û gellek împeratoriyên din bûye.

Kurtefîlma “Koşka Mêriyan” xelata baştirîn kurtefîlmê stand

Kurtefîlma kurdî ya bi navê “Koşka Mêriyan” di festîvala navdewletî ya Swîsrayê de xelata “Baştirîn Kurtefîlm”ê stand.



Çêkerê fîlmê Zana Heme ji Rûadwê re got, çêker û derhênerên navdar ên cîhanê di festîvalê de bi dîtina wê kêfxweş bûn. Zana Heme diyar kir ku fîlm di festîvalê de hat nîşandan û xelata “Baştirîn Kurtefîlm”ê stand. Di festîvalê de 18 kurtefîlm ji bo standina xelatê, hevrikî dikirin.

Fîlma Koşka Mêriyan, 10 deqîqe ye û ji aliyê Rêveberiya Giştî ya Rewşenbîrî ya Germiyanê û Mala Sînemayê ve hatiye çêkirin. Heta niha di gellek festîvalan de beşdar bûye û xelatên baş standine.

Hostayê Erbanê: “Divê Erbane zindî bimîne”



Hunermendê Rojhilatî û hostayê Erbanê Husên Zehawî li bajarê Wanê lêdana Erbanê fêrî dersxwanên xwe kir û got: “Divê kurd li hunera xwe ya resen xwedî derkevin”.

Li bajarê Wanê yê Bakura Kurdistanê, li Navenda Kulturî ya Nûdayê kursa fêrbûna Erbanê ji bo komek hunerhezan hate vekirin. Kursê du rojan dom kir.

Hostayê Erbanê Husên Zehawî beşdarî wê xebatê bû û çawaniya lêdana Erbanê fêrî dersxwanên xwe kir.

Zehawî piştî ku karê wî xilas bû, diyar kir ku yên ku tevlî kursê bibûn bi eşqeke mezin ve dixebitîn û got: “Erbane amûra netewî ya kurdan e, lewma divê ev amûr zindî were hîştin, û were pêşxistin.


Pirtûkek li ser Kurdên Êzidî bilav bû

Nivîskarê navdar Fredrick Ekman û şêwekar Magnus Bertos dawiya sala borî, pirtûkek bi zimanê Swêdî li ser kurdên Êzidî amade kirin, ku ew pirtûk lêkolîneke meydanî ye li ser jiyan û ola Êzidî ye.

Sala 2003 – 2004 bi mebesta lêkolînekê li ser ol û ferhenga kurdên Êzidî, nivîskarên wê pirtûkê serdana Ermenistan û Başûra Kurdistanê kirin.

Kurdên Êzidî, tevî ku gellek ferman û hewlên jinavbirina wan hatine dan, lê dîsa karîne ku ola xwe biparêzin. Wek wan nivîskaran di pirtûka xwe de, li ser zimanê kurdên Êzidî nivîsandine: Her kesî nikare biçe nava baxçeyê Êzîdiyan, ku gerek di serî de li derî dabe da ku derbas bibe, lewma baxçeyê wan her paqij û tendirust maye.

Di wê pirtûkê de hatiye ku, kurdên Êzidî, kêmîneyek in û şanaziyê bi xwe dikin. Wan bi xwîna xwe baxçê Êzîditiya xwe av dane û xwe ji hemû êrîşan parastine.



www.arsiv.kurd.org

Zimanê Kurdî



Gulistan: Serdar tu dizanî çavên me bi kêrî çi tên?
Serdar: Em bi çavên xwe tiştan dibînin.
Gulistan: Pozê me bi kêrî çi tê?
Serdar: Em bi pozê xwe bêhn dikin.
Gulistan: Guhên me bi kêrî çi tên?
Serdar: Em bi guhên xwe dengan dibihîzin.
Gulistan: Devê me bi kêrî çi tê?
Serdar: Em bi devê xwe xurekan dixwin û vexurekan vedixwin.
Gulistan: Diranên me bi kêrî çi tên?
Serdar: Em bi diranên xwe xurekan dicûn.

Beşa 2. Dema lîstikê

Wêneyên endaman û navên wan hevyek bikin.



Tiştonek



A: Mahir Berwarî

1- Hînî û mînî, hêlîna pişta kûnî, ezê dibînim, tu nabînî.
(* Wekî ya çavî ye.)

Bersiv: Patik

2- Kevzê mevzê, av tê dizê.
- Behra şîn e, masî reşin.
- Ji serve şîn e, ji nav de sur e.
- Hespê sê, zingîr li pê.
- Gayê beş, dindik reş, tam xweş, tê hûrkirin beş beş.
- Bajêrê şîn e, mirovêt wî di reş in, dîwarêt wî di sur in,
kilîka wî jî asin e.
- Çûme çolê çolbeyarekî, heft dûv li pey beranekî.
(* şaka zebeş)
- Terr e wek xiyar, sor e wek hinar, şîn e/kesk e wek çinar.

Bersiv:Şitî/Zebeş

3- Dîzka danqut, ji serê gelî çû binê gelî, dindikek jê nerişt.
- Simê gay, tijî birincê qutay.
- Sivorê tiktikî, 107 têşkên di zikî.
- Kumê sorik, tijî morik.
- Hizar mirovêt dibin lihêfkekê ve.
- Himbanok e, pirr danok e.
- Simê gê/gay, tije xwê. (* xiwê li ser nahêt!)
- Sêniya savarê, li quliya darê.
- Sed mal şikakî, ser simê kakî.
- Zerikek/tasek tijî morik e, çi qas tol/dol bike, na rije.
- Min li dikanê kirî hebek, anî malê bû hezar heb.
- Qazana îpraxa berda ji banî, kit neket ber derê xanî.
- Sivorê sik sikî, yê li ser darê pindikî, 1001 di zikî.

Bersiv: Hinar

Têdîtin: Amadekar destkariya devoka metelokan nekiriye

Xwendevanên hêja! Hûn dikarin bersiva tiştonekan bi riya E-Maila Agiri2003@gmal.com ji me re bişînin

www.arsivakurd.org

Agirî

◆ Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
◆ www.Kurdistanmedia.com
◆ www.Agirimedia.org
◆ rojnamaagiri@gmail.com
◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (251)

Çend wêneyên taybet bi rêûresma 10’ê Xakelêwe, roja şehîdên Kurdistanê

















www.arsivakurdi.org